

Rola diyasporaya kurd di çêbûna wêjeya nûjen a kurdî li Swêdê da

Nivîskar: Clémence Scalbert Yucel

Wergêr ji fransî: Elî Paksirêşt

Zimanê ku ji dema damezirîna Komara Tirkîyeyê heya sala 1991'an li Tirkîyeyê qedexa bû, di vê salê da weşanên bi vî zimanê azad bû. Mîrov dikare bibêje ku heya wê rojê nivîsîn bi kurdî di Tirkîyeyê da tunebû.

Digel vê jî, girîng e bê gotin ku di salên 70'yî da ku serdema çêbûna partiyên kurd di Tirkîyeyê bû, tevgera biçûk a wêjeyî bi taybet der û dora kovara Tîrêjê derket holê. Piştî derbeya 1980'yî, ev tevger şikiya. Pes, wêjeya kurmançî di sirgûnê û bi taybet di salên 1980'yî da geş bû. Diyasporaya kurd li Swêdê da ji aliyekî va ji ber sirûştê penaberîya kurd li Swêdê û ji aliyê din va jî ji ber ramyariyên (siyasetên) dewleta Swêdê ku kurdan ji wê baş mifa girt roleka berbiçav lîst. Armanca vê nivîsê diyarkirina rola wêjeyî ya diyasporaya kurd li Swêdê ye. Loma, ez ê di destpêkê da bi kurtasî taybetmendiyên diyasporaya kurd li Swêdê şirove bikim û piştê, ez ê qala ramyariyên Swêdî bikim ku li gor dilê geşebûna wêjeya zimanê kurdiya kurmançî di vî welatî da ye. Di dawiyê da ez ê bibêjim ev wêjeyê çawan li Swêdê hatiye holê û di çêkirina wêjeya kurdî di Tirkîyeyê da rola wê çî ye.

Diyasporaya kurd li Swêdê;

Civaka kurdî ya li Swêdê gelek caran diyasporaya kurdî tê bi nav kirin. Peyva diyasporayê ji hemû diyardeyan ra bi kar tê ku encama penaberîya welatekî mak ber bi çend welatan va ye. Diyaspora di navbereka kunkunî da tê bi rêk û pêk kirin û bi awayê torkî bi raweya asoyî kar dike. Eger hin nivîskar bi bîr tînin ku ev navbera nenavendî ye, hin ên din dibêjin ku cûreyek navendîtî di diyasporayê da heye ku ji aliyê axa rîşeyê wan va pêk tê. Taybetmeniyeka din a wê li bara rêxistina civakî ye. Diyaspora di dirêjîya demê di civaka pejirankar da nayê pişaftin. Bi awayê ramyarî û aborî dikeve nav wê. Ev yek dihêle ku ew xwe bi rêk û pêk bike û karê xwe yê taybet encam bide û tenê ev kar dikare wê çêbike, domdar bike û wekî diyaspora jiyana wî bidomîne û ew jî ji xwe hişyar û agahdar be. Ev karê diyasporayê çavkaniyên xwe peyda dike û piranî jî ber bi welatê çavkanî va diçe. Kurd hindik hindik ji salên 1960'yî va penaberî Swêdê bûn. Di salên 1970'yî û bi taybet piştî derbeya 1980'yî zêde çûn wî welatî. Toreka hevkarîyê ya pir xurt zû li seranserî wî welatî da pêk hat û ji salên 1980'yî va, ev tora bi çêbûna Federasyona Komeleyên Kurdistanê hat xemilandin ku piştê navê xwe guhart û kir Federasyona Komeleyên Kurd li Swêdê. Ev federasyon wekî navbêynkara dewletê û gelê kurd bi taybet bo daxwazên wan ên çandî roleka girîng dilîze. Bo nimûne, ferderasyonê di sala 1983'yan da ji Wezareta Zanîngehan û Xwendinên Bilind daxwaz kir beşa zimanê kurdî vebibe. Ev yek zû pêk hat. Yek ji taybetmeniyên kurdên li Swêdê pêkanîna çalakîyên girîng ên çandî û zimanî ye. Wek mînak, vebûna kursên kurdî, weşanxane, geşbûna nivîsên bi kurdî û her wiha ramyariyên çandî yên Swêdê jî han dide van çalakîyan.

Ramyariyên penaberî û çandî yê Swêdê;

Sa zêdebûna hejmara penaberan li Swêdê, parlamana wî welatî di sala 1975'an da ramyariyeka penaberiyê li ser bingehên jêrîn pejirand: Beraberî, azadiya bijartinê û hevkarî. Di vî ramyariyê da geşbûna zimanî heye. Nêrîna "çenzimani" li wê demê da tê holê. Ev bo rewşekê ye ku kesek di wê da dikare du zimanan baş biaxive û binivîse. Ev nêrîn hat holê ku zimanên zikmakî û zimanên "malî" bi pêş va biçin. Bi vî awayî, ji sala 1975'an va, siyaseta Swêdê ya penaberiyê ji kurdan ra di dibistanan da sa hînbûna zimanên zikmakî yê penaberan bi mifa bûye. Ji salan 1984'an da zimanê Kurdî li wir tê hîn kirin û çalakiyên kêlekê wek weşan û bi taybet weşana pirtûkên zarokan tê pêk anîn. Ramyariyên çandî û yê penaberiyê dibin yek û bi vî awayî geşbûna hêzeka wêjeyî û zimaniya kurdî li Swêdê ra bi mifa dibe. Konseya neteweyî ya Swêdê sa karên çandî (Kulturrådet), ku di sala 1974'an da durist bûye, bûrs dan komên ku di warên cur bi cur ên çandî da (lîstin, şano, wêje, pirtûkxane, û hwd) kar dikin. Di vê çarçovê da, weşanxane û kovarên kurdî li Swêdê arîkariya giştî werdigirin. Ji aliyê din va, nivîskar dikarin bo nivîsînê arîkariyê werbigirin ku ji salên 1980'yî va Binyada swêdî ya Nivîskaran (Sveriges Förtfattarfond) dide. Ev yek rê dide ku hin nivîskarên kurd bi pereyê nivîsîna xwe debar bikin. Ev ramyarî han dide geşbûna çalakiyên wêjeyî û zimanî, vebûna weşanxaneyan û weşîna kovaran ku li Swêdê ji cihên din ên Ewropayê pirtir e.

Pêşveçûna wêjeyeka kurdî li Swêdê;

Îro di komên wêjeyî yê Kurdî da pir caran ev pirs tê pirsîn ku gelo penaberî ji wêjeyê ra baş bûye yan an. Di rastiyê da, derbeyê rewşa derketina wêjeyeka kurdî di Tirkîyeyê da xirab kir lê penaberiyê rê da vê wêjeyê çavkaniyên xwe xurt bike û jiyana xwe domdar bike. Lê ev penaberî berî her tiştî ya xebatkarên ramyarî ye. Ev xebatkarên ramyarî çima û çawan bûn nivîskar ?

Berê, wilo diyar e ku ji xebatkarê ramyarî ra ne hêsan e ji wêlêt dûr be û karê ramyarî bike. Dema ku ziman û pênaseya kurdî li Tirkîyeyê qedexe bû, nivîsîna bi kurdî jî awayekî cuda ji xebatê tê dîtîn. Lê penaberî navbereka azadî û rêvebûnê ye. Wate, mirov dikare hîn bibe, bixwîne û binivîse. Serencam, wisan diyar e ku penaberiyê hestên xurbetê xurt kirin û vê jî han da çalakiyên nivîsînê. Pes, ev xebatkarên berê yê ramyarî dibin xwedan azadî, dem û hin caran pere bi taybet ku eger ji arîkarêyên aborî mifa bigirin û xwe mijûlî wêjeya kurdî dikin. Ew dibin yekemîn nivîskarên nûjen ên kurd li Tirkîyeyê hetanî yekemîn nivîskar û yê herî pispor.

Van nivîskaran gûneyên nû wek roman û nûvêl di wêjeya kurmanciyê da kar dikin. Yekemîn romana Kurmancî (Tu, Mehmet Êzûn) di sala 1984'an da hat weşandin û cihê Şivanê Kurd a Erebe Şemo girt ku di sala 1935'an li Rewanê da hatibû weşandin û gelek caran wekî yekemîn romana kurdî tê bi nav kirin.

Yekemîn berhemên nûvelî di salên 1980'yî li Swêdê da hatin weşandin. Ew berhemên nivîskarên kurd ên cîwar li wî welatî yê wekî Baran, Bavê Nazê, Lokman Polat, Hesenê Metê ne. Yek ji pirsgerêkên herî girîng ên komên wêjeyî û her wisa ramyarî yê kurdî danîna binyata wêjeyeka neteweyî ya bi fermî nasbûyê ye. Bi vî awayî gûneyên cur bi cur dikarin bèn nimandin. Roman û nûvêl ku mirov dikare bibêje tune, berovajî helbestan, atûyên girîng in ku nivîskarên kurd ê hewl

bidin bigihîjin pêkanîna wan. Ev yek yê rê vebike ku nivîskarên wan hinekî jî bi nav û deng bin. Mehmet Ûzûn û romanên wî mînak in. Îro, mirov di kovarên kurdî da dixwîne ku roman gûneyek ji wêjeya nûjen e ku pêwîstiya wê bi demê û gelek kar heye. Wîsan diyar e ku Mehmet Ûzûn ji nivîsîna romanên bi kurdî hez kiriye û xwestiya di vî warî da bibe pêşro. Di rastiyê da, ew yekemîn nivîskarê romanên kurdî ye ku ji sala 1984'an va berhemên wî li Swêdê û hetanî piştî Siya Evînê û Rojê ji Rojên Evdalê Zeynikê yên wî ji sala 1992'an va li Tirkîyeyê hatin weşandin. Wî gûneyeka nû dest pê kir û di wî warî da yekem bû ku li Ewropayê û Tirkîyeyê jî tê nasîn. Yaşar Kemal di pêşgotina Siya Evînê da wî wekî serwerê romana kurdî dide nasîn. Li bara yekemîn romana bi kurdî di Tirkîyeyê da (Reş û Spî ya İbrahim Seydo Aydoğan) divê bibêjim ku ew di sala 1992'an da hat weşandin.

Berhemên van nivîskarên li Swêdê di kovara Nûdemê da tên weşandin ku di sala 1992'an da ji aliyê Firat Cewerî va li Stockholm'ê hatiye weşandin.

Ew di derketin û belavbûna van gûneyên nû (nûvel, nivîsarên wêjeyê û helbesta nûjen a kurdî) da roleka girîng dilîze. Nûdem piranî berhemên nivîskarên li Ewropayê diweşîne. Ew nûnera wêjeyeka kurdî ya nûjen lê li derveyê welêt e. Bi vî awayî dibe nîşana "wêjeyaka diasporayê". Ew nûnerê wan nivîskaran e ku gelek caran bi navê "nifşa 1980'yî"yan jî "nifşa penaberiyê"tê bi nav kirin. Di wê serdemê da mirov dikare bibêje li welêt û Tirkîyeyê da wêjeya kurdî tunebûye û eger jî hebûye ji aliyê wêjeya diasporayê va hatiye nehadîne kirin. Yekemîn nifşa wêjeyî ya bi fermî nasbûyî diasporayê ye.

Hikariya vê wêjeyê li ser wêjeya kurdî li Tirkîyeyê;

Dema ku zagonên Tirkîyeyê di sala 1991'ê da dest bi serbestbûnê kirin, weşanxaneyên kurdî jî bi kurdî weşandin û ên din jî bi vê armancê hatin damezirandin. Lê, hejmareka pir kême heye ku dikare li Tirkîyeyê bi kurdî binivîse. Pes, berhemên nivîskarên kurd ên li Swêdê di salên destpêkê yên 1990'î da dîsan tên weşandin kêmasiyekê tijî dikin. Ew hez dikin berhemên wan rasterast li Tirkîyeyê bîn weşandin sa ku xwedevanan ji nêz va bibînin û berhemên bîn xwendin. Ev nîşana karkirda diyaporayîya van çalakiyan e: Nivîsîna bi kurdî tenê wê demê watedar e ku rasterast ji gelê cîwar li Tirkîyeyê û hetanî yê li Kurdistanê ra binivîsî.

Van nivîskarên kurd ên li Swêdê ku ji borî û nûhanîne mifa girtin, yekemîn kes in ku di warê wêjeya kurdî da bi fermî hatin nasîn û gulçînên cur bi cur yên wêjeya kurdî jî vê yekê nîşan didin. Cîwarbûba li Ewropayê rê dide pêşketineka zû û ev yek ji tirkên li Ewropayê ra jî wîsan e. Ev nivîskaran li Tirkîyeyê ne tenê li cem kurdan lê belê li ba tirkan jî tên nasîn. Tenha nivîskarên kurd ên ku berhemên wan bi tirkî hatine wergerandin û tên xwendin Mehmed Ûzûn, Hesenê Metê, Firat Cewerî ne ku hemû jî li Swêdê dijîn û ji nifşa destpêkê ne. Gulçîna nûvêla kurdî ku ji aliyê Muhsin Kilzîkaya va li weşanxaneyê İletisim hatiye weşandin bi giştî nûnertiya vê riyê ye.

Encam;

Nivîskarên swêdî ji yekemîn nasîna fermî di warê wêjeya kurdî û hin caran jî di warê wêjeya li Tirkîyeyê da mifa girtin. Wan yekemîn nifşa nivîskarên nûjen ên kurdiya kurmanciyê çêkirin.

Penaberî û rêxistina diyasporayî rê da wêjeya kurdî bi pêş bikeve û di serdema qedexeyê da hebe. Ji sala 1991'ê va, ev wêjeya kurdî bi saya kovarên zimanê kurdî û weşanxaneyên taybetzan, li welêt didome. Îro, nifşa duyem li welêt tê dîtin. Diyasporaya Swêdê berhemên nivîskarên nûjen geşe pê nade wekî ku li gor wan pêşeroja wêjeya kurdî tenê dikare li welêt û nêzîkî civata çavkaniyê û xwendevanên belkêyî û pêkan be.

Çavkanî: http://www.institutkurde.org/conferences/integration_des_kurdes/Clemence+Scalbert.html